Projeya Kembera Erebî li Cizîrê, derbasî sala 34-an dibe

Rêberê Silîvî

Bi hatina roja Şemiyê 8/7/2006-an, projeya Kembera Erebî li Cizîrê derbasî sala 34-an dibe, xizanî, belengazî û perîşaniya Kurdan pê re dikeve saleke nû ji temenê xwe.

Raste ku evqas meh û sal di ser vê projeya ne mirovane re borî ne, lê, ji ber bandora wê ya mezin li ser jiyana gelê me, ew rojekê bi tenê jî nehatiye ji bîrkirin, û tucarî nayê ji bîrkirin.

Roja 8/7/1973-an, rojnameya(Albe,s), di hejmara xwe ya 3170 de, biryara çêkirina komîtekê ji berpirsiyarên parta serdest û dewletê weşand*, ya ku pê re 10 milyon p.s ji bo pêkanîna wê projeyê terxandibû, ew roj li nik Kurdan bûye rojeke reş û bê qidoş.

Dema projeya kembera Erebî û serhejmara awarte bi destê şoven û zikreşan bi hev re bûne heval, kambaxî û malwêraniyê li Kurdan dest daye. Ji hêlekê ve, Kurd ji nasnama welatê xwe bêpar bûne, dergehên xebatê li pêş wan hatine girtin, ji hêla din ve, xaka bav û kalên wan, bi darê zorê ji wan hatiye sitandin û li Erebên ku, ji derdora parêzgeha Heleb û Reqayê li Cizîrê hatibûn cîwarkirin, **D.R.(12)**



مصور منطقة مشروع "الحزام العربي" على خارطة سوريا

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de